

Tuncer CÜCENOĞLU

AŞİT (ÇİĞ)

DERDOR:

Maleke yekqat a ku dişîbiya malên herêmên çiyayî ya li wargeheke biçûk ku li derdora wê çiya hebûn; hundirê malê...

Ji şîbakên wê şembelîkên ku bi sivrimekan ve daliqîbûn xuya dikirin. Bi dîwarê malê ve du tîfing daliqandî ne. Berê namlûyên tîfingan li hev e, lê qundaxên wan ji hev dûr... Hema bêje bi heman estefîkê hatine daliqandin.

Li aliyê çepê odeyek. Li ortê saloneke mezin. Li aliyê rastê deriyê ku diçe odeya din. Deriyê derve tam li hember e.

Li cihê weka salonê bixêriyeke kevn. Li ba wê jî êzingên ku bi rêk û pêk hatine danîn. Li erdê merş, xaliyên biçûk yên bi dîwaran ve.

Dîsa li salonê def û çemçova wê heye. Weka ku li benda roja lédana xwe bin li goşe sekinîne

Li odeya li milê çepê MÊRÊ CIWAN û JINA CIWAN li odeya xwe razayî ne.

Li cihê weke salonê, PÎREJIN, nêzî şomîneyê hatiye bicihkirin, li qatîyan dinihêre, di navbera xew û bêxewiyê de maye.

Li ba wê hevserê wê KALEMÊR wek miriyekî bêdeng razaye. Hema bêje hebûna wî ne diyar e.

Li odeya li milê rastê MÊRIK Û JINIK razayî ne.

Her kes di nava cihên xwe de ye.

Beşên malê bi dîwaran ji hev nehatine veqetandin.

Tevahiya dîmenan ne rast in, sembol in.

Bi temamî bêdengî serdest e...

Ev bêdengiya giştî heta dawîya lîstîkê berdewam dike. Meş û cihguheritin jî, ji bo bêdengiyê ne. Wisa ye ku çalakî hema bêje wek filmekî ku giran bigere. Axafîn heta dawiyê dê wek kurtepiştîyê werin kirin.

Divê bi temaşevanan bidin vehesandin ku lîstikvan hewl didin bi dengê bilind neaxivin, her tiştî bêdeng bikin, her ku biçe ji vê yekê ditirsin.

KES:

PÎREJIN 70 salî ye. Heta tu bêjî zindî ye. Ji bo balê bikşîne ser xwe, xwe wisa nîşan dide ku nikare bimeşe.

KALEMÊR 80 salî ye. Encax dikare bi gopalê xwe bimeşe.

JINA CIWAN 18 salî ye bi hemle ye.

MÊRÊ CIWAN 20 salî ye.

MÊRIK 45 salî ye.

PÎRIK 40 salî ye.

SEROK (MÊR) 75 salî ye.

JINA ENDAM 70 salî ye.

MÊRÊ ENDAM 60 salî ye.

PARÊZVANÊ YEKEM 35 salî ye.

PARÊZVANÊ DUYEM 35 salî ye.

Dem: Dema niha.

Cih: Welatekî ne diyar.

Derdor hêdî hêdî ronî dibe.

Ne dengê kûçikekî ne jî dengê dîkekî tê... Bêdengî serdest e.

Her ku roj hiltê, ronahî û spîtahî dide hundir.

Bi vê yekê re weka ku bêdengî jî her ku diçû zêdetir dibû.

Pîrejin, destpêkê bawer e ku her kes razayî ye û radibe.

Diçe tuwaletê. Piştî demekê tê û li cihê ku wek metbexê ye tiştê digire, bi lez dixwe. Ji aliyekî ve jî ji bo yek wê nebîne li derdora xwe mêze dike.

Jina ciwan rûyê xwe diçiqirîne û serê xwe bilind dike.

Xuya ye ku sanciya wê heye. Difikire ka hevserê xwe şiyar bike yan na. Şiyar nake û bi bêdengî ji nava ciyan radibe.

Xuya ye ku bi hemle ye...

Pîrejin fam dike ku jina ciwan rabûye û tê. Bi lez tevî xwarina di devê xwe de diçe dikeve nava cihê xwe. Weka ku razayî be bêdeng disekine. Ji bo ku jina ciwan dilê xwe pê bişewitîne lihêfê ji ser xwe davêje.

Jina ciwan bêdeng dimeşe, pêşiyê diçe salonê, dûre diçe tuwaletê.

Pîrejin li jina ciwan temaşe dike.

Jina ciwan, piştî demekê vedigere salonê. Weka ku hinekî rihet bûbe. Bi heman baldariyê dimeşe. Dibêje qey pîrejin razayî ye, lihêfê davêje ser. Dema jina ciwan diçe, pîrejin li aliyekî bextewariya gihîştina armanca xwe dijî, li aliyekî jî xwarina di devê xwe de dicû.

Jina ciwan, xwe di nava cihê xwe de dirêj dike.

Vê carê mêrik radibe, ji odayê dertê. Ji salonê derbas dibe û bi bêdengî diçe derve.

Pîrejin dîsa weka ku razayî be bêdeng dimîne. Ji ber ku dizane dê mêrik dîsa were, lihêfê ji ser xwe davêje.

Piştî demekê mêrik tê, lihêfê davêje ser pîrejinê. Derbasî odeya xwe dibe, xwe li ser cihê xwe dirêj dike.

Pîrejin careke din çavên xwe vedike, serê xwe geh bi aliyê rastê ve, geh jî bi aliyê çepê ve dibe û tîne û difikire.

Jina ciwan, ji nişka ve bi êş ji cihê xwe radibe. Xuya ye ku dîsa sancoyî bûye...

JINA CIWAN (destê xwe li hevserê xwe dixwe) dibêje rabe.

MÊRÊ CIWAN (bi sergêjiya xewê) dibêje çi ye?

JINA CIWAN Zikê min

MÊRÊ CIWAN Çi bû?

JINA CIWAN Dêşê.

MÊRÊ CIWAN Here tuwalêtê.

JINA CIWAN Çûm

MÊRÊ CIWAN Wisa be?

CINA CIWAN Careke din dest pê kir ez ditirsim.

MÊRÊ CIWAN (Ew bi xwe jî bawer nake) Ji çi ditirsî?

JINA CIWAN Çawa ji çi?

MÊRÊ CIWAN Xuya ye te serma girtiye. (Lê dîsa jî bi tirs e) Wekî din dê çi be.

(Bêdeng nemîne.)

MÊRÊ CIWAN Çawa yî?

JINA CIWAN Derbas bû.

MÊRÊ CIWAN Tişteki tirsê tune.

JINA CIWAN Min got qey ewk.

MÊRÊ CIWAN Çi?

JINA CIWAN Min got qey sanciya min dest pê kir.

MÊRÊ CIWAN wisa dibe?

JINA CIWAN Wisa be ev êş çi ye?

MÊRÊ CIWAN Tu ba û sanciyê tevî hev dikî.

JINA CIWAN dilebite, dilebite.

MÊRÊ CIWAN Destê xwe dibe ser zikê hevsera xwe û bi bextewarî dikene. Çiqas xweş e! Weka ku bêsebir be.

JINA CIWAN Divê çend rojên din jî sebir bike.

MÊRÊ CIWAN (Bi destê hevsera xwe digire) Van tirsan ji heşê xwe derxe. Herî hindik mehek maye. Tişteki tirsê tune. Li van deran nehatiye dîtin ku zarok berî dema xwe were dinyayê. Dapîra min ev ji te re negotin?

JINA CIWAN Lê yên berî dema xwe jî zarok anîne hene.

MÊRÊ CIWAN Te ji kê bihîst?

JINA CIWAN Ji dapîra xwe.

MÊRÊ CIWAN Lê pir berê bûye.

JINA CIWAN Çi ferq dike?

MÊRÊ CIWAN (Weka ku girîngiyê nedê xwe nîşan dide) Beriya ku em bên dinyayê.

JINA CIWAN Jina bi hemle bi saxî xistine tabûtê.

MÊRÊ CIWAN Ji te re got?

JINA CIWAN Ji dayîka te re digot, min bihîst.

MÊRÊ CIWAN Ew tişt di demên borî de bûne. Êdî tiştên wisa nabin. Divê tu hinekî din jî razêyî!

Jina ciwan çavên xwe digire, hewl dide ku razê. Dora tirsê a mêrê ciwan e. Destê xwe dide porê jina xwe. Lê bi fikar e.

Spîtahiya ku ji derve daye hundir, derketiye asta herî bilind. Lê bêdengî her ku diçe zêde dibe.

JINA CIWAN (Çavên xwe vedike) Lê ku bi rastî jî sanciya min dest pê bikira?

MÊRÊ CIWAN Nabe

JINA CIWAN Çima?

MÊRÊ CIWAN Lewre extiyar her tiştî hesab dikin.

JINA CIWAN Qet şaşiyê nakin?

MÊRÊ CIWAN Na!

JINA CIWAN Çima?

MÊRÊ CIWAN Lewre şaşî bandorê li wan jî dike. (Bêdeng nemîne.)

JINA CIWAN Lê tu jî tirsiyayî.

MÊRÊ CIWAN Ne xwezayî ye?

JINA CIWAN Ku wisa be tirsê min jî xwezayî ye.

MÊRÊ CIWAN Min dijberê wê tişteke negot. Lê rewşeke wiha li holê tune. Jixwe piştî du rojan be, dê tu xetere nemîne. Dê hespên me, kerên me, kûçikên me, çêlekên me, pezê me, dîk û mirîşkên me jî paşve bînin. Ji bo sê mehan be jî. Dûre dema tiving biteqîn, tuyê zaroka xwe bînin. Dê zaroka me cara pêşîn biqîre. Em ê ji wê qîrînê netirsin. Dê bi caran biqîre! Dê yê din jî netirsin. Lewre wê demê êdî xetere tune. (Destên xwe bi porê jina ciwan dide.)

Dê her kes stranên bibêje.

Dê yê herî extiyar jî serxweş bibin, li meydanê bireqîsin. Tam sê meh! Dê sê mehan ev wiha berdewam bike. Dûre dema cara pêşîn berf bibare, ez û tu em ê zarokê/a xwe bigirin ba xwe, ji çiyayan derbas bibin, ji van deran biçin. Ji bo em zaroka xwe bêtirs mezin bikin. Yê tevî heywanên xwe hatine jî dê bi heman awayî paş ve vegerin. Lewre hesp dikin hîrîn, ker dikin zirîn, kûçik diewitin, çêlek dikin orîn, dîk azan didin û mirîşk jî dengê xwe dertînin. Ez jî te re tişteki bi dîzî bibêjim?

JINA CIWAN Bibêje.

MÊRÊ CIWAN Em ê tu carî êdî neyên van deran. Weka ciwanên ku berî me ji vira çûbûn. Em ê jî ji van deran herin û têra dilê xwe bijîn. Bê tirs. Heta ku em mirînê nêzî xwe hîs bikin. Em ê encax wê demê vegerin van deran. Weka pêşiyên xwe.

JINA CIWAN Dema ku havîn jî were em ê neyên?

MÊRÊ CIWAN Tu û kurê me na, lê ez ê werim

Lewre divê em xwarina zivistanê ya kesên li vira dimînin bînin. Ev qas mirov bê ar, şeker û xwê dê çi bikin?

JINA CIWAN Te got tu û kurê me. Tu çawa dizanî ku dê kurê me çêbibe? Belkî jî keçikek ji me re çêbibe.

MÊRÊ CIWAN Belkî jî tenê gotinek bû.

JINA CIWAN Lê ez jî dixwazim diya xwe û bavê xwe bibînim. Ez ê nikaribim bêyî wan bisekinim.

MÊRÊ CIWAN Tiştê ew bi vir ve girêdaye çi ye? Ew jî dikarin bi me re werin.

JINA CIWAN Wê demê bila yên we jî werin! Ger em hemû bi hev re herin, demborî be jî, tu yê jî careke din neyêyî vira.

MÊRÊ CIWAN Ên me nayên. Lewre dapîra min û bapîrê min ji bo mirinê hatin vira. Dev ji yên me berde. Em li zaroka xwe mêze bikin. Bila zaroka me bê tirs mezin bibe. (Nizane ku jina ciwan raza ye.)
Extiyarekî zana wiha gotibû: “Dema tirs hebe, hêza mirov a fikr û ramanê pêşve naçe. Rewşa herî neyînî ya ku fikrên mirov tevîhev dike tirs e. Bila zarokên me vê tirsê ku jiyana me tevan di nava xofê de hiştiye nejin!”

Na na ez ê destûrê nedim vê yekê.

(Mêrê ciwan fam dike ku jina wî raza ye. Bêdeng ji balê radibe, diçe salonê. Pîrejîn dîsa weka ku razayî be tevdigere.)

MÊRÊ CIWAN Dapîra min, ez dizanim tu şiyar î.

PÎREJIN Çi ye kurê min?

MÊRÊ CIWAN Ez ê tiştêkî ji te bipirsim.

PÎREJIN Bipirse.

MÊRÊ CIWAN Çend roj berê te ji diya min re gotiye. Te behsa keseke ku berî dema xwe zarok aniye dinyayê kiriye.

PÎREJIN (Bi fikar) çima ev yek te têkildar dike?

MÊRÊ CIWAN Hevsera min, pir tirsiyaye.

PÎREJIN Çima ditirse, yê wê pirsgirêkek wê ya wisa tune ye!

MÊRÊ CIWAN Tune ye lê pir tirsiyaye. Ciwan û bê tecrube ye. Di bin bandorê de maye. Bi rastî min jî meraq kir.

PÎREJIN (Bi kêf) Wê demê ez weka hevsera te ciwan bûm. Em çar keçikên ciwan bûn, zewicîbûn. Em hemû bi daweteke bi nav û deng zewicîbûn. Lê ji bo têkiliyê diviyabû herî hindik em çar mehan bisekinin. Extiyarên wê demê ev yek ji me hemûyan re jî gotin. Sê kes ji me ji hevserên xwe dûr man. Lê yekê ji me

şaşî kir. Her şev têkilî danîn. Dûre? Piştî ku ji sê meh ma xetereya aşîte derbas bibe, sanciya zarokanîne bi wê girt. Û dûre jî bûyer qewimîn.

MÊRÊ CIWAN Çi bû?

PÎREJIN Pîvan diyar bûn. Derhal gazî pîrikekê kirin. Her tişt rast bû. Dadger civiyan û biryara li bendê bûn hat dayîn. Hevala me kirin tabûtê û xistin goreke ku berê hatibû kolan.

MÊRÊ CIWAN Hevserê wê çi kir?

PÎREJIN Pir giriya. Ji bo asteng bike lava kir. Heta ji lijneya dadgeran xwest ku wî jî bixin gorê. Lê jê re gotin ku tiştêkî were kirin tune. Û nehiştin wî bi hevsera wî re bixin gorê.

MÊRÊ CIWAN Dûre?

PÎREJIN Piştî ku sê meh di ser re derbas bûbû û xetereya aşîte derbas bûbû tabût hatibû vekirin. Û tiştêkî ku em ji bo hevala xwe bikin nemabû.

MÊRÊ CIWAN Lê ev pêkanîneke dermirovî ye.

PÎREJIN Ev yek ji bo jiyana yê din pêwîst bû. Nedibû tevî ku xetereya aşîte dihat zanîn jî, kesên din bixistina xetereyê! Wekî din nikaribûn tiştêkî bikin?

MÊRÊ CIWAN Çi dizanim? Belkî jî dikaribûn di dema zarokanîne de devê jinikê girêbidana. Bi wî awayî dê bikaribûna pêşî li qîrîna jinikê bigirtina.

PÎREJIN Tu dizanî fikrên bi vî rengî ji bo me qedexe ne. Demên borî jî wisa bû, niha jî wisa ye. Lê me jinan jî yekî re negot û di nava xwe de ev yek jî ceriband. Lê kîngê? Dema ku xetere derbas bû û me li dû hev zarok anîn, em hemû weka ku aşîte bikeve bêdeng man. Qîrînen wisa bûn ku mirov bawer nedikir. Wisa olan dida di kendalan de. Weka ku ji bo bi ser me ve were, gazî aşîte bike. Qîrîna zarokekê jî dikaribû bibûya sedema mirina me tevan. Ji bîr neke ku rêzikên herî hişk bi xwe jî, ji bo bextewariya mirovan in.

MÊRÊ CIWAN Ev bextewariyeke çawan e? Bextewariya ji ber binaxkirina hinek kesan, karê kîjan wijdanê ye?

PÎREJIN Kê ev tişt hemû kirin hişê te? Tiştên wisa neke serê xwe. Xilas bû çû. Dibêjin belayek ji hezar şîretan baştir e. Belkî jî, ji ber wê mirinê ye pêncî sal in, êdî tiştêkî wisa nehat serê me.

(Mêre ciwan bêdeng dimîne û dûre diçe tuwalête. Jina ciwan ji odeya kêlekê radibe. Bêdeng ji nava cihê xwe derdikeve. Hewl dide ku hevserê xwe şiyar neke, bêdeng ji odeyê derdikeve. Rastî pîrejinê te.)

PÎREJIN (Tuwalête nişan dide.) Kurê te li wira ye.

JINA CIWAN Tu çima şiyar bûyî?

PÎREJIN Ez birçî bûme.

JINA CIWAN (Weka ku nebihîze.) Hinekî din jî rakeve!

(Mêrik jî bêdeng rabûye, hatiye.)

PÎREJIN (Dibîne ku kurê wê hatiye lê weka ku ew nedîtibe tevdigere.) Birçî bûme. Birçî!

JINA CIWAN Tu her tiştî ji min dixwazî.

PÎREJIN Ger piyên min bigirin ez mineta te dikişînim?

JINA CIWAN (Hinek tiştan amade dike, dide ber pîrejinê.) nerijîne nava nivînan.

PÎREJIN Min kîngê rêtiye?

JINA CIWAN Min negot te rêtiye, min got nerêje!

PÎREJIN Ger min nerêtibe, çima tu dibêjî nerêje? Wê demê ez baldar im.

JINA CIWAN Tu çima bê sedem gotinan dibêjî!

PÎREJIN Ger tu wisa tevnegerî ez jî gotinan nabêjim.

JINA CIWAN Baş e, wê demê bibêje!

PÎREJIN Wisa zzwa di qirika min de derbas nabe!

JINA CIWAN Înşelah tu çayê jî nexwazî!

PÎREJIN Hinek av bes e!

(Mêrê ciwan axaftina wan bi sebir guhdar kiriye. Awiran dide hevsera xwe.)

MÊRÊ CIWAN (ji hevsera xwe re) Gelek karên ku em bikin hene. Divê em xwe amade bikin.

JINA CIWAN Tu li vira bûyî?

MÊRÊ CIWAN Her kesî şiyar bike

JINA CIWAN (Bi bêdengiyê zêdetir) Ger ji ber diya te fersendê bibînim!

(Pîrejin ji kurê xwe re îşaret dike ku neviyê wê çûye tuwaletê.)

PÎREJIN Av!

(Jinik bi gilî û gazin diaxive û avê didê, dûre diçe cihê bixêriyê daran tevdide. Agir baş vêketiye. Hinek ava din jî dike ser çaydanê ser agir. Mêrik xwe nêz dide û destê xwe dide hinarikên pîrejinê.)

Pîrejin, bi çavan giliyê jinikê jê re dike.

Mêrik hînbûyî ye, weka ku bibêje “îdare bike” tevdigere.

Mêrê ciwan tê. Mêrik ji kurê xwe re îşaret dike ku bûkê jî rake.

Mêrê ciwan serê xwe dihejîne û derbasî odeyê dibe, xwe xwar dike û destê xwe di porê jina ciwan dide. (Jina ciwan bi destê hevserê xwe digire, demekê wisa bi bextewarî disekine.)

MÊRÊ CIWAN tu niha çawa yî?

JINA CIWAN baş im.

MÊRÊ CIWAN Min ji te re got. (bêdeng nemîne.) Karê em bikin wisa zêde ye. Tu êdî rabî baş e.

(Jina ciwan jî radibe. Bêdeng doşek û lihêfa xwe qat dike. Bi hevserê xwe re derdikeve derve. Dema pîrejîn û jina ciwan li erdê sifreyê datînin, mêrik û mêrê ciwan tifingên bi dîwar ve tînin xwarê.

Mêrik, ji tûrikê ku kurê wî aniye alavan dertîne, nîşanî kurê xwe dide û tivingekê paqij dike.

Mêrê ciwan weka bavê xwe tivinga li ber xwe paqij dike.

Pîrejîn û jina ciwan bi dîmeneke wek filmê dereng digere ji aliyekî ve sifreya li erdê amade dikin, ji aliyekî ve jî derdorê didin hev.

Di vê navberê de her du tiving jî hatine paqijkirin.

Şûseyên çayê têne tijekirin.

Dema mêrê ciwan dixwaze tivinga ku paqij kiriye tije bike, mêrik rûyê xwe diçiqirîne û wî asteng dike.)

MÊRIK Niha nabe. Hê dema wê nehatiye.

MÊRÊ CIWAN Rewşa avê çawa ye?

MÊRIK (Bi destê xwe pênase dike) hê sê tilî valahî hebû.

Tivingan bi heman awayî bi cihên wan ve daldiqînin.

Dema jinan karên xwe yê dawîn ên ji bo sifreyê dikirin mêrê ciwan jî guleyan tevî qutiyên wan datîne nêzî tivingan, dûre avê li destê bavê xwe dike da ku rûyê xwe bişo.

Mêrik bi pêşgirê rûyê xwe ziwa dike.)

MÊRÊ CIWAN Ez li delavê mêze bikim?

MÊRIK Tu dikarî mêze bike.

(Mêrê ciwan bêdeng derdikeve derve. Winda dibe.

Jin, amadekirina sifreyê diqedînin.)

MÊRÊ CIWAN (Tê, bi destê xwe nîşan dide.) Bi qasî du tilî û nîvan e.

MÊRIK Baş e. Belkî îro tije bibe û em jî tivingan biteqînin. Lê herî dereng dê sibê bi şev tije bibe.

MÊRÊ CIWAN Înşelah, bila zêde dereng nebe!

MÊRIK Ev lez û bez ji bo çi ye? Bila bi xêr tije bibe, bila rojekê, du rojan dereng bimîne! Kesekî nedaye dû me!

(Pêşiyê mêrik li ser sifreyê rûdinê. Dûre yên din.)

MÊRIK Te çima bavê min şiyar nekîr?

PÎREJIN Em bi rihetî bixwin. Ez ê dûre wî şiyar bikim. Bila ji me re nebe asteng. Hûn dizanin ev çi mirov bû? Qey dihat zeftkirin? Pêşiyên me dibêjin divê mirov pîrîtiya gur jî bibîne. Belê bibînin. Dema gur pîr bibe, wiha dibe.

JIN Bila kalbûneke wiha li serê her kesî b e. Her karê xwe dibîne.

PÎREJIN (Bi awayekî dilşewat kenîya) tu wisa bizanibe!

(Her kesî hewl dida ku bêdeng be, çaya xwe vedixwarin, zikên xwe têr dikirin. Jina ciwan şûşeyên ku vala dibûn, tije dikir.

Pîrejî dema xwarina li ber wê diqede, destê xwe li milê kurê xwe dide û hin tiştan jê dixwaze. Carna jî ji neviyê xwe dixwaze. Lê ji jinikê qet naxwaze. Kalemêr ji nişka ve radibe ser xwe.

Bi awirên bêwate li wan dinêre.)

PÎREJIN Xwe nêz bike. (Ji yên din re.) Cih vekin, bila nêz bibe. Nêz were. (Bi destê xwe wî dikişîne, hewl dide wî bîne nêzî sifreyê.) Xwe nêz bide.

(Mêrik jî dibe alîkar. Pîrejî hewl dide ku pariyekî bixe devê hevserê xwe.

Mêrikê extiyar bi zorê dixwe, weka ku dermanekî tal be.)

PÎREJIN (Destên xwe berjor dike û daxwaz dike)

Xwedê! Min nexe van rewşan! Dema roja min hat ruhê min bistîne.

Kalemêr (Bi dengêkî ji yên din hêdîtir, hema bêje dengê wî naçe kesî.) Ez jî çûm.

MÊRIK Xwarina xwe bixwe bavo.

KALEMÊR Yên ciwan tev çûn. Careke din jî venegeriyan. Lê me çi kir? Em vegeriyan. Dema zivistan diqediya em vedigeriyan. Bi xwê, şekir, ceh û genimê xwe yê ku me ji xebata zivistanê kar kiribû vegeriyan. Ji bo ku zivistanê ew qas mirov bixwin. Me her sal hûn zêdetir hînî bêdengiyê kirin û em vegeriyan. Em êdî her tim li vira ne. Ji ber vê yekê jî, mafê teqandina tivingê pêşiyê yê min e. Ev her sal wiha bûye. Niha jî dê wisa be. Dê wiha jî berdewam bike.

MÊRIK Xwarina xwe bixwe bavo.

KALEMÊR Yê/a egîd ew e ku zaroka xwe mezin bike û vegere. Hem jî kêfa qîrînê bizanibe û bixwaze vegere. Di nav we de kesekî ku jî egîdiya min re tiştêkî bibêje heye? (Bêdeng nemîne) Em ê kîngê tivingan biteqînin?

MÊRIK Belkî sibê bavo.

MÊRÊ EXTİYAR Min biçûk dibînin. Goya ez wekî filên nêzî mirinê vegeriya me axa xwe.

MÊRÊ CIWAN Çi dibêjin bila bibêjin bavo. Yê ku dizane dizane. Ji bo ku te ji axa xwe hez dikir tu vegeriyaî van deran.

KALEMÊR (digirî) Ger hûn rastiya wê bipirsîn, ez jî tam nizanîm çima ez vegeriya. (Careke din) Êdî ne xwarin, ne jî vexwarin, tu tiştêkî tamê nade min. Teqandina tivingan jî. Çivîka te naxwîne! Diranê te nabire, nacû. Ev jî jiyan e qey!

PÎREJIN (Xwe bi xwe) Diranên te her dem birîn, cûtin! Çivîka te jî her dem xwend! Bide ber tiştên ku tu jiyayî! (Ji hevserê xwe re) de haydê weka dînan neaxive xwarina xwe bixwe!

JIN (Tam bêdeng) ew aciz kirin!

KALEMÊR Lo! Ger tu dijî, divê çûka te bixwîne, diranê te bibire! Ez encax wê demê dikarim bibêjim ez dijîm.

PÎREJIN Me rojên ku çûka te dixwend jî dît! Xelqê ji xwe re kêfa xwe kir. Ka ji me re fêdeyek hebû?

KALEMÊR Ger tu qîmeta wê nizanibî bêguman dê fêdeya wê tune be.

PÎREJIN Ger tu rojê sê danan çûkan bidî xwendin dê ne nirx bimîne ne jî hewes! Tu her roj hinguv bixwî tu yê jê aciz bibî!

KALEMÊR Wê demê jî, yên tu wan nadî xwendin dê kesên din wan bidin xwendin! Hinekî jî sûc bike aliyê xwe!

PÎREJIN Te zêde dirêj kir! Xwedayê min rojên ku çûkên te nexwendin jî nîşanî min da, ez êdî xeman naxwim! (dike qîrîn) çaya xwe vexwe! Lewre ji bo vexwarina çayê pêdivî bi diranan nîn e! Binihêre wa ye bê diran jî tu dikarî xwarina xwe bixwî. (bi bêdengî) Halbukî ger çûka te nefire tu hewl bidî tewş e!

KALEMÊR (Xwe aciz dike) Bisekine hermet! Têkilî her tiştên min nebe!

PÎREJIN Baş e wisa be. Hinekî din jî derdê xwe bibêje! Bigirî! Bigirî! Tu yê rihet bibî bigirî!

(KALEMÊR bêdeng digiriya, yên din taştêya xwe dixwarin. Dinya tam ronî bûye. Weka ku roj di nava odayê de be.

Kalemêr jî çawa xwe vedixwe, taştêya xwe xilas dike. Radibe, diçe tuwalêtê.

Pîrejin û jina ciwan jî sifre berhev dikirin.

Mêrikê extiyar tê, rûdinê.

Dema jina ciwan li cihê wek metbexê bêdeng firaqan dişo, kalemêr, ji jinikê re bi destê xwe îşaret dikir ku cixareyê bidê.)

MÊRIK Bidê!

(Jinik, yek ji cixareyên ku veşartibû dirêjî mêrikê extiyar dike. Mêrikê extiyar bi kêfxweşî cigareyê digire. Ji bo cixareya wî vêxe îşaretê dide kurê xwe. Mêrik cixareya bavê xwe vêdixe.)

KALEMÊR (Bi kêfxweşî cigareyê dikşîne. Demekê kûr difikire. Ji kurê xwe re) Te apê xwe nas nekir. Ger bijiya dê niha li vira li ba min bûya. Du salan ji min mezintir bû. Kesekî bêdeng bû. Qet nedixaxivî. Em tev ditirsyan. Me digot ku dengê derkeve dê aşî bikeve. Lê ew zêdetir ditirsya. (Odeyê nîşan dide) Em li ba hev radizan. Carna bi şev bi xewnerêşkan şiyar dibû. Xwêdan dida. Min jê dipirsî çî bûye. Bersiv nedida. Dûre dema rojekê min got ez ê ji tu kesî re nebêjim, hemû xewnerêşkên xwe ji min re got. Got ku ew bi hemû hebûna xwe hîs dike ku weka hema dê bi gurmîniyekî her tişt biqede. “Em çiqas baldar bin jî, ku kesekî din şaşiyekê bike? Em hema tune dibin. Gurmîniyek û em tune ne. Tu tiştêkî ku em bikin tune ye. Xwedê, neçarî çiqas zor e!” Tu tiştêkî em bikin tune ye. Xwedê neçarî çiqas zor e!” Ditirsya û hemû jiyana xwe bi tirsê dê aşî bikeve diborand. Tirs mirovan tune dike. Tirs gurê mirovan e.

Dîsa şevêkê şiyar bû. Ê ji min re wiha got: “Ez niha dixwazim derê derve û bikim qîrîn. Bawer im ez nikarim xwe asteng bikim...” Min got “Tu dîn î? Dê aşî bikeve wê demê. Em ê hemû bimirin. Goya tu jî aşîte ditirsiyayî. Qey tu natirsî?” Got ku “Dema ecel were tirs fêde nake. Ez êdî ji tirsê aciz bûm. Ji bo ez netirsim jî hêviyê min a din nema! Ger jîyan timî bi tirs be, mirov bimire û qet netirse hîn baştir e. Ez ê rojekê dengê xwe bilind bikim û bikim qîrîn!” Min got “baş e”. Tu yê wê demê me jî ji tirsên me rizgar bikî.” Min wisa got lê paşê ez pir tirsyam. Lê ku gotinên min cidî bigirta û bikira qîrîn?

(Kalemêr ji nişkave di xew de diçe. Camêr, xwelîdanka bavê xwe hiltîne. Jina ciwan ku firaq dişûştin, diheje, rûyê xwe tirs dike. Mêrê ciwan ji rewşa jina xwe dikeve şikê û tê balê.)

MÊRÊ CIWAN (bi dengêkî ku kes nebihîse) Çî bû?

JINA CIWAN Dîsa dest pê kir.

MÊRÊ CIWAN Dê derbas bibe.

JINA CIWAN Ez nikarim li ber xwe bidim. (dinale) Nikarim tehemul bikim.

MÊRÊ CIWAN divê tu li ber xwe bidî!

JINA CIWAN Di destê min de nîn e.

MÊRÊ CIWAN sebir bike!

(Pîrejîn, dikeve şikê û li her duyan temaşe dike. Lê tu wateyê nade rewşê.)

JINA CIWAN Ez dikarim çî bikim?

MÊRÊ CIWAN bila fêm nekin!

JINA CIWAN çawa?

MÊRÊ CIWAN em biçin odehyê.

Mêrê ciwan û jina ciwan bêdeng û hêdî derbasî odehyê dibin. Weka ku tu rewşek neyînî tune be bêdeng dikevin odehyê.

Sanciya jina ciwan berdewam dike.)

MÊRÊ CIWAN Niha çawa ye?

JINA CIWAN Berdewam dike!

JINA CIWAN Dê derbas bibe.

JINA CIWAN Bawer im tiştê em jê ditirsîyam hat serê me. Min heta niha êşeke wiha nedîtiye. Ev tiştêkî din nîn e, sanciya zarokanîne ye! Teqez sanciya zarokanîne ye! (Bêdeng digirî)

Dê niha çêbibe? Em ê çî bikin?

MÊRÊ CIWAN (Neçar e lê dîsa jî) Na! Hê roja te tamam nebûye! Têkiliya me nêzî sersalê bû. Hê neh meh jî neqediyayee. Yek jî deh rojên wê jî hene. (Bi tiliyên xwe hesab dike) Herî hindik hê mehek maye dema te. Dê derbas be. Reşbîn nebe!

(Pîrejîn, tunebûna bûkê ferq dike. Li firaqan mêze dike. Dibê qey firaq li benda wê hiştine û xwe aciz dike. Firaqan dişo.

Mêrik, li ser parçeyên texteyan şeklan çêdike.

Pîrejîn hewl dide ku fam bike ka çî dibe. Kalemêr tam bala xwe daye ser. Heta hêdî hêdî dike xirînî. Pîrejîne firaqan şuştine.)

PÎREJIN (destên xwe ziwa dike ji mêrê xwe re) te bûk dît?

MÊRIK Derbasî odeya xwe bûn. Çima dipirsî?

PÎREJIN Firaq neşuştine wisa hiştine.

MÊRIK Wisa bi ser keçikê de neçe. Dema wê nêz bûye.

JINIK Xwezî xezûrekî min ê weka te hebûya. Kesek ji bo min wiha nedifikirî.

MÊRIK Dema borî tevî niha neke.

JINIK Dema mijar ez bim tevîhev neke! Lê niha ez wan xwedî dikim. Hem jî her duyan.

MÊRIK Tu yê xwedî bikî. Karê te ev e. Dê zarokên me jî me xwedî bikin.

JINIK Ez şaş dimînim tu çawa ji ciwanên niha hêvî dikî. Kî vegeriya ku ew vegerin? Kanê bila zarokeka wan çêbibe tuyê bibînî. Ku biçin dê careke din bizivirin? Ji nifşa nû zarokên kê vegeriyên ku ê me vegerin?

MÊRIK Kurê min cuda ye dê bizivire.

JINIK Kurê te dê bixwaze were lê wê bûka te destûrê bide? Ka binihêre li nava devê wê mêze dike. Weka ku tenê ew bi hemle be.

(Pîrejinê hîs kiriye ku kurê wê û bûka wê di navbera xwe de nîqaş dikin. Hewl dide fam bike lê... Ji aliyekî ve jî hewl dide yên li hundir bibîne.)

MÊRIK Bila dîsa kurmê xesûtiyê neyê te!

JIN navê rastiyê bûye xesûtî.

MÊRIK Te pir dirêj kir lê. Me bûkîtiya te jî dît. Tiştên te bi diya min kiribûn min ji bîr nekirine. Tu hê jî ezyetê pê didî kişandin.

(Bêdeng nemîne.)

Êşa jina ciwan sekiniye. Hevserê wê rûyê wê yê xwêdandayî bi pêşgîrê ziwa dike.)

MÊRÊ CIWAN Binihêre derbas bû.

JINA CIWAN îşelâh.

MÊRÊ CIWAN Em derbasî hundir bibin. Bila nekevin şikê.

(Mêrê ciwan û hevsera xwe derbasî hundir dibin. Pîrejinê hê jî fam nekiriye çî bûye, diyar e ku hewl dide fam bike. Jina ciwan diçe cihê wek metbexê.)

JINIK (Bi gazin) zehmetê nebîne keça min. Min şûşt.

MÊRÊ CIWAN Hinekî hişê wê çû dayê.

(Mêrê ciwan jî li ba bavê xwe rûdinê. Parçeyên texteyan digire destê xwe. Ew jî xêz dike. Yek xilas kiriye. Datîne ba yên din û dest bi yekî din dike. Jina ciwan, lihêfê davêje ser kalemêr. Darên nava agir tevdiide.)

PÎREJIN (şermok.) Kurê min ê min bibe (Mêrik û kurê wî ji cihê xwe radibin. Diyar e ku nizanin pîrejin dikare bimeşe. Dikevin her du milên pîrejinê û hêdî hêdî wê dibin tuwaletê.)

JINIK (Piştî wan radibe û derî digire) tu biteqî!

JINA CIWAN Qet nebe dayê. Ya ku negota me yê çî bikira?

JINIK (Bihêrs) em ê çî bikin? Ji neçariyê me yê qebûl bikira. Keseke min a ku bigota ez ê ji aliyekî ve bi vî karî bigrim hebûya, ez ê dîsa xemgîn nebûma!

JINA CIWAN Li qîsûrê min mêze neke dayê. Ez tam giran bûme. Dîsa jî çî ji destên min tê, ez hewl Didim alîkariyê bikim.

(Jinik bersiv nade dengê xwe nakin.)

Mêrik û ciwan, pîrejinê tînin dikin nava cihê wê.)

PÎREJIN Xwedê ji we razî be! Xwedê îşê we li hev bîne! Xwedê çî di dilê we de heye bibe serî. Xwedê zarokekî berxekî bide te!

MÊRÊ CIWAN Îşelâh dapîra min. Îşelâh di roja xwe û saete xwe de Xwedê bide! Em jî bi wî awayî ji tirsên xwe xilas bibin!

(Mêrik û mêrikê ciwan careke din parçeyên texteyan digirin destên xwe. Ser wan xêz dikin. Pîrejin devê xwe û pozê xwe digire û bêdeng dibênije.

YÊN DIN Her bijî!

PÎREJIN Hûn hemû bibînin.

KALEMÊR (Ji nişka ve şiyar dibe. Çîroka der barê birayê xwe de berdewam dike.) min got “na. Tu yê vê yekê nekî! Neqîrî! Lewre wê demê em ê hemû bimirin! Tu qet nafikirî ku em ê hemû bimirin?” “Ez difikirim lê ez bi xwe nikarim. Ez dixwazim derkevim ber derî û biqîrim.” Dema wiha digot min fam dikir ku xemgîn e. Lewre digiriya. “Ger wiha biçe, dê mirina we tevan bi destê min be. Ay Xwedê ev çî azwerî ye wiha. Qet nedîtiye ku wiha bi azwerî mirov bixwaze biqêre. Weka ku mirov jinekê bixwaze. Ez bi hemû hebûna xwe dixwazim biqîrim. Ez dev ji vê hestê bernadim, nikarim pêşiyê li xwe bigirim.” Rewşa min hîn zortir bû. Lewre aşî tîrsa her kesê/î bû. Lê tîrsa min ew bû ku kekê min rojekê biqîre. Ku ev yek bi xwe aşî bû. Çavên min li ser kekê min bûn. Dema diçû tuwalête ez li dû wî bûm. Min tim bi lava li çavên wî mêze dikir. Carna kulma xwe çêdikir devê xwe vedikir, dema awirên min ên neçar didît jî, diranên xwe dişidinad û daxwaza xwe ya qîrîniyê asteng dikir. Dûre rojekê got ku “Ez êdî naxwazim biqîrim!” Min got “Bi rastî?” Got belê. Ez nikarim bibêjim ku çiqas kêfxweş bûm. Rondik ji çavên min hatin. Bêyî ku bibêjim “Kekê min baş dibe” wî axaftina xwe berdewam kir. “ka ez biqîrim jî, ez ê çiqasî biqîrim! Qîrîn min têr nake. Ez ê tivinga xwe biteqînim! Belê ez ê tivingê biteqînim! Lewre dema ez tivingê biteqînim dê van çiyayan pir cuda bi ser mirovan ve werin!” Ay Xwedê. Kekê min bi rastî jî dîn dibû. Her ku diçû dîntir dibû. Tiştêkî ku min bikira tune bû. Min çû rewş ji bavê xwe re got. Bavê min got “Ev baş e” Ger em guleyên tivingan veşêrin dê tu tişt nebe.” Min got “lê ev tedbîreke baş nîn e. Îcar ku wê demê jî aciz bibe? Li gor min dema tivingê neteqîne dê teqez pir aciz bibe û li dû jî bike qîrîn. Jixwe ji bo aşîte hewce nîn e mirov tivingê biteqîne bavo. Qîrînek bilind ji bo bidawîbûna her tiştî bes e. Kekê min kiriye serê xwe. Dê aşîte bi serê me de bîne xwarê. Tu hê jî vê rastiye vedîşêrî. Li ser navê parastina wî! Halbukî ez jî kurê te me. Ez ê jî bimirin wê demê. Hûn ê jî. Halbukî ku em agahdar nekin ne tenê tu, em ê jî bikevin rewşa sûcdaran. Em ji aşîte xilas bibin jî. Bavo divê tu êdî vê yekê qebûl bikî. Kekê min dîn bûye. Ger em ji bo tedbîrgirtinê agahî nedin, ew ê jî tam dîn bibe û biteqîne em ê çî bikin bi qîrînê? Dema aşîte bi gurmînî bikeve kî ji me dê bikaribe xwe xilas bike? Di vî karî de merhemet dibe? Ji bo merhemeta jî kesekî re em dikarin li mirina tevan temaşe bikin? Kekê min be jî divê tu agahdar bikî bavo!” Bavê min cara pêşîn bû bi awayekî cidî difikirî. Bavê min êdî li ber xwe neda. Got “Tu mafdar î. Çû rewş ji koma extiyaran re got. Bêdeng lê guhdar kirin. Demeke dirêj bersivê nedanê. Lewre cara pêşîn bû rastî rewşeke wiha dihatin. Li ser vê yekê bavê min got: “Hûn ê bi kurê min çî bikin? Mafê min e ez bizanibim.” Piştî ku dadger hinekî fikirîn gotin “em ê çî bikin maye welatî! Diyar e em ê çî bikin.” “Herhal em ê li benda roja mirina xwe nesekinin! Em ê devê wî, dest û lingên wî girêbidin û wî li quncikekî dirêj bikin.” “Heta kîngê” “Heta xetereya aşîte biqede. Na, na ne mumkun e ku em devê wî vebikin. Mirov çawa baweriya xwe bi mirovekî dîn tîne. Lê ku biqîr?” Lê bavê min jî mafdar e, dibêje: “Mirov bê av û xwarin çawa dikare bijî? Hûn bi zanîn wî terkî mirinê dikin.” Lê jixwe lê guhdar jî nekirin. Derhal dest, mil û devê kekê min girêdan û ew dirêj kirin. Carna xwarin didanê. Ji bo pêşiyê li qîrîna wî bibirin jî di dema xwarinê de ji

aliyekî ve tiştêk dikirin devê wî, ji aliyekî din ve jî bi tîrsa ku dê hema niha bike qîrîn destên xwe yên mezin ji ser devê wî hilnedianîn. Pazdeh roj bi vî awayî derbas bûn. Gotin rihet e pazdeh roj. Dûre rojekê hatin gotin “Kur ê te mir!” Me qet fam nekir bi xwe mir yan wan ew fetisandin. (Radizê)

MÊRIK (ji kurê xwe re) tu bi vê çîrokê dizanî?

MÊRÊ CIWAN Çawa nizanî?

JINIK Cara çendan e em guhdar dikin!

JINA CIWAN Min bi xwe jî herî kêr sê caran guhdar kir.

PÎREJIN Dema xetereya aşîte derbas bû min cara yekem zarok anî dinyayê. (Ji kurê xwe re) Xwedê tu dayî. Dema berfa pêşîn barî me terka van deran kir. Li cihê ku em çûn demeke dirêj dîsa wiha bêdeng bûn em. Cihê em lê diman, taxa kesên ji vira koçber bûbûn bû. Hînbûyînen me yên li vira eynî bûn. Yanî em koçber bêdeng û tîrsonêk bûn. Niştecihên wê derê pir ji me hez dikirin. Dixwestin em di hemû karan de bixebitin. Lewre me qet nedigot na û bertek nîşanî wan nedida. Tiştê didan me, me qebûl dikir, tiştê nedidan me jî, me îtîraz nedikir. Were were. Biçe biçe. Bide bide. Yê di karên herî giran de dixebitîn em bûn! Niştecih ji me pir cuda bûn. Bi deng bûn û dikirin qîrîn. Dikaribûn têr bikeniyana. Ji me jî pir hez dikirin, lê destûr nedidan ku em li ser vira biaxivin. Digotin “Me hûn qebûl kirin! Hûn êdî çi dixwazin? Bixebitin! Em destûrê nadin berhevdaniyê!” Dûre zarokê min ê duyem çêbû. Dîsa kur bû. Lê nejiya. Dûre keçikek me çêbû. Ew jî nejiya. Ger werim ser vêya ew jî guherî. Goya bi ber birayê xwe diket. Her şev serxweş dihat malê. Digot “Dê ev êş min bikuje!” Min bawer dikir. Dûre min fam kir ku diçe ba jineke din. Dema min got “Tu çima diçî?” Digot “qey ez dizanim ji êşa birayê xwe çi dikim? Bi ser min de neyê!” Pirî negot “Bi ser min de neyê” têkiliya wî bi hemû jinên herêmê re çêbûbû. Sedema vê yekê jî êşa birayê wî bû. Digot “Bihêle ez xwe mijûl bikim! Yan na dê ev êş min bikuje.” Ez ji hevserê xwe hîn bûm ku jin, ji bo derbasbûna êşa mêran hebûnên çî zor in. Pîrejeneke extiyar cîranê me bû. Dizanibû ku hevserê min yekî çiqas tolaz e. Rojekê hat mala me û got ku “riyên cur be cur hene mirov mêran vegeftine malê!” Got “Li cihê tu digirî û gazinan dikî, li xwe binihêre, wî bi rûkenî pêşwazî bike!” Tiştên got min kir. Lê qet min nedidît. Li ser vê yekê ji min re got xwarinên ku herî zêde jê hez dike jê re çêke. Lê dema dihat malê, xwarinê herî jê hez dikir jî nedixwar. Lewre têr dihat. Serxweş û têr. Ez zoriya têrkirina têran jî, ji hevserê xwe hîn bûm. Cîrana me ya xwedî tecrube, dawiyê rêya sêyem pêşniyar kir ji min re. Hem zarok, hem jî ez dem bi dem em ê nexweş biketina. Bi vê yekê ez hîn bûm ku bi nexweşiyê mirov, bi taybetî bala hevseran tê kişandin. “Tenê nexweşiya zarok bes nîn e. Divê tu jî nexweş bikevî ku hêviya wî nemîne li zarok binihêre.” Min şîret bi cih anîn û bi vê yekê hevserê min vegeftiya malê. Lê bedêlê wê! Hûn niha mêze nekin ku ew weka melayîketan razaye! Pir bi min da kişandin pir!

(dîsa ji nişka ve êş bi jina ciwan digire. Wisa dibe ku xwe duqat dike. Bi hewldaneke mezin derbasî odeya kêlekê dibe. Hevserê wê fam dike û li dû wê diçe. Jixwe bala wî li ser hevsera wî ye.

Lê pîrejîne jî dîtiye. Şaşewaz bûye û hewl dide ku rewşê fam bike.)

JINA CIWAN Ez nikarim tehemul bikim! Ay Xwedê! Nikarim li ber xwe bidim!

MÊRÊ CIWAN Ez dikarim çi bikim? Sebir bike!

JINA CIWAN Fam bike êdî ev sanciya zarokanîne ye! Ay Xwedê tu çi dikî, bike min rizgar bike!

(Pîrejîn, bi îşaretan hewl dide ku tiştêkî ji mêrik re bibêje. Ji ber ku mêrik fam nake bi lez radibe piyan û diçe ba kurê xwe. Piştî ku jînik dibîne pîrejîn dikare bimeşe şaş dimîne, hema bibêje lal dibe.)

PÎREJIN Kurê min! Werin!

MÊRIK çi ye dayê?

JINIK Dimeşe! Diya te dimeşe!

MÊRIK Dayê tu dimeş!

PÎREJIN dimeşim? Belê belê dimeşim.

Dev ji rêveçûna min berdîn. Bûk zarok tîne!

MÊRIK Tu çi dibêji dayê?

JINIK! Diya te dimeşe

MÊRIK yaw jînik te nebihîst dibêje çi! bûk zarok tîne

(Her sê jî derbasî odeya kêlekê dibin. Demekê bi şaşwazî temaşe dikin. Yê din ferq nekirine ku hatine.)

Mêrê ciwan bênavber ji jîna xwe re îşaret dike ku bêdeng be.

Jîna ciwan jî di nava êşê de diçe û tê.

MÊRIK çi ye kurê min?

JINIK tiştêk bû?

MÊRÊ CIWAN tiştêk tune.

JINIK ka binihêre

JINA CIWAN Zikê min diêşê. (Hewl dide ku nede xuyakirin) Dê niha derbas bibe.

(Çavên hemû kesên li ser jîna ciwan e.

Jîna ciwan hewl dide ku êşa xwe veşêre. Lê êdî tehemul nake, dikeve erdê.)

JINIK Ev! Ev! Ay Xwedê!

MÊRÊ CIWAN Na dayê. Tenê zikê wê diêşê.

JINIK îşlah. Tu avê vedixwî?

JINA CIWAN Ez êdî nikarim tehemul bikim. (dinale.)

MÊRÊ CIWAN (bi destê xwe devê hevsera xwe digire) dê niha derbas bibe.

JINA CIWAN Derbas nabe.

MÊRIK çi bûye?

MÊRÊ CIWAN zikê wê diêşê bavo.

JINIK Qet naşibe êşa zik. Min çend caran zarok anîne dinyayê. Ev sancî ye sancî!

MÊRIK Ay Xwedê!

PÎREJIN Min ji we re got!

JINIK dê niha çawa bibe

(Êşa jina ciwan derbas bûye. Hinekî rihet bûye. Lê rûyê wê xwêdan daye.)

MÊRÊ CIWAN Min ji we re gotibû dê derbas bibe. Binêrin derbas bû.

JINIK derbas nebû tenê navber ketê. Dê hinek paşê dîsa dest pê bike.

MÊRIK Tu çi dizanî?

JINIK ku ez nizanibim dê kî bizanibe? Ger gelek ji wan nejîn jî, min ji şeşan zêdetir zarok anîn dinê. Em aşkere biaxivin. Ev êş a zarokanîne ye.

(Demekê bêdeng nemîne.)

MÊRÊ CIWAN Tu çawa tam fam dikî ku zarokanîn e dayê?

JINIK bawer im te nebihîst. Min got ji derveyî te herî hindik pênc caran ez ketim vê rewşê.

(Careke din bêdeng dibin.)

MÊRIK divê em baş bizanibin.

JINA CIWAN Derbas bû. Zikê min dêşiya sekînî.

JINIKA PÎR: Tim wisa dibe. Pêşiyê diêşê, paşê diçe. Ji nû ve diêşê û ji nû ve diçe. Paşê jî.

MÊRIKÊ CIWAN: Çawa?

MÊRIK (*Bibiryarî*): Here û bangî pîrikê bike.

MÊRIKÊ CIWAN: Lê...

MÊRIK: Em mecbûr in ku bangî wê bikin. Ku ne sancoya zarokanîne be pirsgirêk namîne. Her wiha em ê jî rihet bibin hûn ê jî. Ji dêvla ku mirov bi tirsê razê, şiyarbûn çêtir e.

MÊRIKÊ CIWAN: Lê ku sancoya zarokanîne be?

MÊRIK: Bang bikê bila bê.

MÊRIKÊ CIWAN: Lê ku sancoya zarokanîne be?

JINIK: Wê çaxê jî tê wê wateyê ku me peywira xwe bi cî aniyê. Tiştêkî din ku em bikin tune ye. Divê ku em bangî pîrikê bikin.

(Demeke dinê bêdeng dimînin.)

MÊRIK: Em nikarin hê zêdetir berpirsiyariyê bigirin ser xwe. Çiqas dem diçe xisar li me tê. Divê em li gorî rêbazan tevbigerin.

MÊRIKÊ CIWAN: Lê.

MÊRIK (*Bibiryari*): Em nikarin jiyanên din têxin xetereyê. Ger ku neyîniyek hebe divê em agahdar bikin, divê em ji bîra nekin. Em bi rêbazan dizanin. Em nikarin derkevin derveyî rêbazan. Bangî pîrikê bike.

MÊRIKÊ CIWAN: Na!

MÊRIK: Divê em bangî wê bikin.

MÊRIKÊ CIWAN: Ne sancoya zarokanîne ye, ev! Berê jî wiha bû, ku çû destavê derbas bû. Tiştêkî tune ye. Hûn dibînin tu tiştêkî wê tune ye! Em hinekî din jî bisekinin.

MÊRIK: Em ê li benda çi bin? Bila bîne?

MÊRIKÊ CIWAN: Jixwe wê zarokê neyne!

MÊRIK: Tu ji ku derê dizanî? Divê em baş bizanibin. Ez dibêjim bang bikê!

MÊRIKÊ CIWAN: Dayê bisekine! Bêheq em her kesî ranekin ser lingan. Bisekine!

MÊRIK: Wê li benda çi be? Tu dikî ku dema me derbas bibe! Xwe ne ewirîne! Here û bangî bike!

JINA CIWAN: Dayê bisekine! Binihêre derbas bû! Va ye derbas bû. Tiştêkî min tune ye! Ez sond dixwim ev ne sancu û filan e!

JINIKA PÎR: Ku ne sancu ye tu çima ditirsî qîza min? Dê pîrik rewşê bibêje û hûn ê jî, em ê jî rihet bibin. Ne wisa ye berxê min?

MÊRIK: Dêya min rast dibêje. Divê em baş bizanibin. Ê, vêya jî ancax pîrik dikare ji me re bibêje.

MÊRIKÊ CIWAN: Lê ku sancoya zarokanîne be?

JINIK: Me bersiva vê da! Ma me neda? Ji ber ku me di wextê wê de agahî nedaye ma wê ceza nedin me? Ma tu nizanî sêcê giran ew e ku mirov ser tiştêkî wiha bigire?

MÊRIK (*Bibiryari*): Em mecbûr in ku emîn bibin. Nexwe berî roja wê, we têkilî danî?

MÊRIKÊ CIWAN: Tu çawa bêberpirsiyareke wiha ji min hêvî dikî yabo?

MÊRIK: Nexwe çima tu dixwazî bibî asteng ku pîrik were? Bibêje ji min re, çima? De bibêje! Bêje! Bêje ez ji te re dibêjim! Bêje! Bêje! Tu li min guhdarî nakî? De bibêje!

(MÊRIK, diçe cem kurê xwe û qirincokan li canê wî dide ku hêrsa xwe di serê wî re derxe.)

MÊRIKÊ CIWAN: Yabo, ne weke tiştê ku tu difikrî ye! Bi Quranê ne wisa ye!

MÊRIK: Nexwe çima tu ditirsî qewat! (*Şidandina canê wî didomîne*) Tu yê şerefa min daxî pênc qurîşan. Deyûs, ma te nikaribû meheke din sebir bikî! Tu ne doxînsist bûyayî ma ev dihatin serê te? Ma ji niha û pê ve em ê bikaribin derkevin nav xelkê? Tu yê bikî ku navê me bibe malbata doxînsist! Bêar, bêfedî! Bi bêsebrîya xwe te him em him jî xwe xist xetereyê! Nav û dengê min wê dakeve pênc pereyan! Bi saya te em ê wek malbateke ku jiyana her kesî davêje xetereyê bên bibîranîn! Wê mirov ji me bi dûr bikevin. Wê bi me bawer nebin! Wê me ji nav xwe biqewirînin!

MÊRIKÊ CIWAN: Min tiştê nekiriye, yabo!

JINA CIWAN (Bi kelegirî): Me tiştê nekiriye, yabo! Tiştê tirsê me nekiriye!

(MÊRIK hinekî disekine. Ferq dike ku zêde mesele giran kiriye.)

JINIK: (*Kurê xwe ji destê hevserê xwe derdixîne*) , min nekiriye. Wî berde.

(MÊRIK dev ji kurê xwe berdide. Hinekî disekine, aramî têyê.)

MÊRIK (*Car de bibiryarî*): Her wiha divê em emîn bin. Here û bangî pîrikê bike. Xwe ne ewirîne! Zûka!

JINIK: Ez bêjim çî?

MÊRIK: (*Bêdeng dimîne, hinekî difikire.*) Bibêje “Em ji rewşa bûkê ketine gumanê. Tu wê bibînê baş e. Em dixwazin emîn bibin.” Lê ji bira neke, sancî bîstîka din bû. Bila nebêjin dem derbaskirine!

(Jinik xêliyêkê tavêje ser serê xwe û bêdeng dertê kolanê. Jinika ciwan jî li aliyekî bêleqe digirî li aliyê din jî berguhik xistiye guhê xwe, muzîkeke dilzîziyê guhdar dike. Yê dinê bi fikar bendewar in...)

PERDE

BEŞA DUYEMÎN

II

(Jina Ciwan li ciyê xwe yê mîna menzeleyekê, liberketî û bi fikar rûniştiye. MÊRIKÊ Ciwan nêzikî hevsera xwe rûniştiye, difikire. Wek ku li çareseriyê digere. Jinika pîr li ciyê xwe rûniştî, awirên xwe bera derî daye, bendwar e. MÊRIK car carina di paceyê de li derve dinihêre û li nav malê digêre. Kalemêr di xew de ye. Deriyê derve vedibe û jinik dikeve hundir.)

MÊRIK: Çi bû?

JINIK: Min got.

MÊRIK: Çi got?

JINIK: Tê.

MÊRIK: Çima bi te re nehat?

JINIK: Divê ku agahî bidana qerewêlan.

(Jinik, derbasî cem bûka xwe dibe. Hinekî bisekin be jî, ji bo ku li ber dilê wê bide porê bûkê mizdide.)

JINIKA CIWAN: Ma hat?

JINIK: Wê bê. Dema ku ez ne li vira bûm, tiştek bû?

JINIKA CIWAN: Na.

JINIK: Tişta ku em jê ditirsin, neyê serê me?

JINIKA CIWAN: Înşelah.

JINIK: Belkî jî ne sancoya zarokanîne ye.

JINIKA CIWAN: Înşelah.

JINIK: Tu ji min neqeheriyî ne wisa?

JINIKA CIWAN: Ma mafê min î qehirîne heye?

JINIK: Em çi bikin? Em mecbûr bûn ku zû bi zû agahiyê bidin. Ez an jî yeke/î din qet ferq nake. Diviya bû yek here agahiyê bide.

JINIKA CIWAN: Ez dizanim.

(Bêdengî.)

JINIKA CIWAN: Ez dîtirsimn.

JINIK: Ma çi ji destên me tê?

JINIKA CIWAN: Ez pir dîtirsim.

(Dibû ku MÊRIK di paceyê de hatina pîrikê dîtibe, lewra diqilqile û tê cem Jinikê.)

MÊRIK: Tê!

(Jinik û MÊRIK derî vedikin.)

JINIK: Hûn bi xêr hatin!

MÊRIK: Fermo.

(Pêşiyê Pîrik û paşê jî Qerewêlê yekem dikevin hundir.)

PÎRIK: Sibeha we bi xêr.

QEREWÊLÊ 1.: Çavên we ronî bin.

MÊRIK: Sibeha we bi xêr.

MÊRIKÊ CIWAN: A we jî.

JINIK: Ji te re jî.

JINIKA PÎR: Tu bi xêr hatî berxika min.

(Pîrik, diçe destê Jinika Pîr.)

JINIKA PÎR: Xwedê ji te razî be, berxika min.

(MÊRIKÊ CIWAN jî diçe destê Pîrikê.)

PÎRIK: Tu sax bî kurê min.

MÊRIKÊ CIWAN: Ne sanco ye.

PÎRIK: Înşelah.

JINIK: Hûn tişteki venaxwin?

PÎRIK: Di rewşên wiha de dem pir girîng e. Em dereng nemînin. Ger rewşeke tirsîner tune be, ez ê qehweyeke we vexwim, berî çûyînê.

JINIK: Înşelah.

PÎRIK: Înşelah. Bûk li ku ye?

(Jinik li pêş, Pîrik li pey dimeşin.)

MÊRIK: (Ji Qerewîlê yekem re) Li ser lingan nemîne!

(Qerewîlê yekem rûdinê. Pîrik, tê cem Jinika CIWAN. Porê wê mizdide.)

PÎRIK: (*Ji Jinikê re*) Tu derkeve!

(Jinik diçe cem ên dinê.)

PÎRIK: Derbasî be qîza min.

JINIKA CIWAN (Dengê wê dilerize.): Tu sax bî xaltîkê.

PÎRIK: Pêşiyê em bipeyîvin.

JINIKA CIWAN: Baş e.

PÎRIK: Lê ez çî bipirsim, tu yê rast bibersivînî. Temam?

JINIKA CIWAN: Temam.

PÎRIK: Hûn kîngê zewicîn?

JINIKA CIWAN: Di orta meha berfanbarê de.

PÎRIK: Berê we her duyan tiştê kir? Hevmaçîkirin filan. Belkî we cahilî kiribe, hinekî hûn pêşve jî çûbin. Divê tu ji min venaşêrî.

JINIKA CIWAN: Ez venaşêrim!

PÎRIK: Ez ji bo qenciya te dipirsim.

JINIKA CIWAN: Bi Quranê ez tiştêkî venaşêrim.

(Pîrik bi tiliyan dihejmêre. Paşê ji nû ve dihejmêre.)

JINIKA CIWAN: Ez pir ditirsim xaltîkê.

PÎRIK: Tiştêkî tirsê tune ye berxika min. Di demê de xeletiya we tune. Li gorî vî hesabî herî kême mehek ji zarokanîna te re heye.

JINIKA CIWAN: Înşelah.

PÎRIK: Ger tu niha zarok bînî, hûn beriya dema xwe bi hev re razane. (Ji nû ve dihesibîne.) Herê, rast e. Lê tu dizanî hesabê şaş ji vir û Şamê vedigere. Ger tu tiştêkî ji min venaşêrî ev ne sancoya zarokanîne ye. *(Bi guman li rûyê wê dinêre.)*

JINIKA CIWAN (*Gumanê fêhm dike.*): Ez venaşêrim. Bi sonda qedîm ez rast dibêjim. Jixwe ma em çawa dikarin bên cem hev? Malbatên me nehiştin ku ji dûr ve jî em hevdu bibînin. Ne ku bihêlin em bi tenê bimînin.

PÎRIK: Ma barût û niftik li cem hev disekin qîza min? Him jî ku bûyereke biêş hatibe jiyin.

JINIKA CIWAN: Te li wê jî nihêrîbû?

PÎRIK: Na lê. Ma ez ew qasî pîr im? Zûde çêbûye. Di ciwaniya dapîra min wan de. Lê ji wê rojê û vir ve bûyerek wiha qet çênebûye. Înşelah careke din çênabe.

JINIKA CIWAN: Înşelah.

PÎRIK: Tirsâ te çû, ne wisa.

JINIKA CIWAN (*Ditirse, lê dîsa jî*) Çû.

PÎRIK: Bila biçê. Tiştêkî tirsê tune. Êdî em dikarin lê binihêrin. Divê em tam emîn bibin. Razê. Li ciyê xwe. Xwe dirêj bike, xwe dirêj bike.

(*Jinika CIWAN li kêlekê xwe dirêj dike.*)

PÎRIK: Li ser piştê...

(*Jinika Ciwan, serê xwe ber bi temaşevanan datîne û xwe li ser piştê dirêj dike.*)

JINIKA CIWAN: Wiha?

PÎRIK: Belê. Çîpên xwe bikişîne ber nava xwe. Her duyan jî. Fîstanê xwe jî bikişîne. Baş e.

(*Pîrik, fîstanê Jinika Ciwan hinekî din jî paşve dibe.*)

PÎRIK: Qûna xwe bilind bike. Rake rake. (*Derpiyê Jinika Ciwan derdixe.*) Eferim. Tiştêkî ku tu jê bitirsî tune ye. (*Xwe vexwar dike, bi destên xwe vedinêrîne. Dest dide zikê wê. Dubare sêbare vedinêrîne. Radibe.*) Xwe girêbide. (*Jinika Ciwan xwe girêdide, radibe ser lîngan û destên xwe li ber xwe datîne ser hev û bendwar e.*)

PÎRIK: Sancoya pêşîn kengî hat?

JINIKA CIWAN (*Aşkere ye ku derewan dike.*): Beriya ku we agahdar bikin.

PÎRIK(*Diqehire.*): Qet derewan neke! Kengî hat? Divê ku ez zanibim. Kesên din bila nizanibin lê divê ku ez zanibim! Berî niha jî înselâh te derew nekîr!

JINIKA CIWAN: Min nekîr.

PÎRIK: Min li sancoya pêşîn pirsî.

JINIKA CIWAN: (*Hebikî birawestî*) Berî ku tav bavêje.

PÎRIK: Paşê?

JINIKA CIWAN: Hinekî din dem bihurîbû ku cardin hat.

PÎRIK: Paşê?

JINIKA CIWAN: Cardin hat.

PÎRIK: Paşê?

JINIKA CIWAN: Hew hat.

PÎRIK (hebikî bêdeng dimîne.): Tu dizanî qîza min, ez diya te baş nas dikim. Bi salan em cîranê hev bûn. Bêşik ez pir li ber ketim. Lê divê ez rewşê ragihînim rêveberan. Him li gorî rêbazan û him jî ji bo berjewendiyên civakê ev divê. (*Dengê xwe nizimtir dike*) Ji wan re behsa sancoya dawîn bike. Te fêhm kir?

JINIKA CIWAN: Min fêhm kir.

PÎRIK: An na tu yê serê yên di malê de jî têxî belayê! Ha viya jî qet jî bîr neke! Mirov ji Xwedê hêviya xwe nebire! Belkî jî ne sancoya zayînê ye, ya te.

JINIKA CIWAN (neçar): Înşelah! Gelo wê dê û bavê min jî bîn?

PÎRIK: Na! Lewra ne li gorî rêbazan e.

JINIKA CIWAN: Qet nebe, bangî dêya min bikirina.

PÎRIK: Di kevneşopiya vî karî de tiştekî wisa tune ye. Darizandin li mala ku lê ye, pêk tê. Di vî karî de qet ciyê hestiyariyê tune.

(Pîrik bêdeng di ber ên din re dibihure.)

MÊRIK: Çi bû?

PÎRIK: Ez destên xwe bişom.

(Jinik, bi zerikê ava sar tevlî ava germ dike, şîregerm dike û li destên pîrikê dike.)

JINIK: An na?

PÎRIK (*destên xwe ziwa dike*): Min pir dixwest, lê qey ne qismet bûye. Ez ê qehweyê venexwim. Dilê xwe jî min negirin. Rêgez ev e. Divê ez agahiyê bidim. Ez çî bêjim? Derbasî be! (*Ji qerewêlê yekem*) Tu li vir bimîne!

(Pîrik hêdî hêdî dertê. Jinik derî li pey digire. Her kes liberketî ye. Kalemêr di xewê de ye. MÊRIKÊ Ciwan derbasî cem hevsera xwe dibe. MÊRIKÊ Ciwan û Jinika Ciwan hevdu hembêz dikin.)

KALEMÊR: (Şiyar dibe. Li derdora xwe dinêre. Ji ciyê ku maye axaftina xwe didomîne.) Lê ku hûn ji min bipirsîn îş cuda bû, mirina kekê min ne jixweber bû. Ew kuştin! Dilê wan qet pê neşewitî, ew tune kirin! (Ji nşka ve Qerewêlê yekem dibîne.) Hûn qerewêl! Hûn! (Destê xwe wek ku gefê li Qerewêlê yekem dixwe, dirêj dike.) We ew kuşt! We! Bi fetisandinê, him jî bi destên xwe! Kujerno! Qerewêlên kujer!

(Jinika Pîr bêdeng dixwaze hevserê xwe bêdeng bike.)

TARÎBÛN

III

(Bendewariya bi acizî didome. Bi ser dejî Qerewêlê yekem dixwaze fikra Kalemêr di der heqê wî de vebêje. Kalemêr bêdeng bûye lê carinan dîsa bi hêrs li Qerewêlê yekem dinihêre. MÊRIK jî di wê navberê de carinan di pacê re li derve dinihêre û li nav malê digere.)

MÊRIK: Tê!

JINIK (*Ji Jinika Pîr re*): Çawa be tu dikarî bimeşî. Tu jî rabe. Her wiha wê di rêzdayînê de me qisûr nekiribe.

MÊRIK: Ji dêya min biqere!

KALEMÊR: Ew fetisandin! Kujerno! Qerewêlên kujer!

JINIKA PÎR: Ev ne ew qerewêl in. Tu her tiştî tevlîhev dikî.

KALEMÊR: Tevlîhev nakim. Yek jê ev bû! Tu bûyî ez zanim, tu bûyî xayîn! Qerewêlê xayîn! Qerewêlê kujer!

QEREWÊLÊ 1. (*Ji Kalemêr re*): Bavo, me kî fetisandiye? Min kes nefetisandiye! (*Ji yê dinê re*) Ev çi dibêje lo!

MÊRIK (*Bêdeng ji Qerewêlê yekem re*): Pir kal bûye bavê min. Bûyereke pir kevn, jê we ye ku îro çêbûye, ew qasî kal bûye. Guh nedê!

KALEMÊR (Dibe wek niqniqorkê): Qerewêlê kujer! Qerewêlê kujer! Qerewêlê kujer!

QEREWÊLÊ 1.: Me belaya xwe dît!

KALEMÊR: Qerewêlê kujer! Qerewêlê kujer!

QEREWÊLÊ 1.: Lê ka ev wisa nabe!

MÊRIK (*Wek ku bibêje “ez ê çareser bikim” li Qerewêlê yekem dinêre. Li ser bavê xwe dizivire.*) :
Mepeyîve êdî bavo! Mepeyîve! (*Ji yên dinê re*) Hatîn. (*Kalemêr bixeyd bêdeng dibe. Jinika Pîr jî di nav de her kes ber bi derî ve diçe. MÊRIK derî vedike.*)

MÊRIK: Fermo.

JINIK: Hûn bi xêr hatin.

JINIKA PÎR: Bi xêr û selamet.

(*Endamên Lijneya Darizandinê: di serî de Serokê wan, Endama Jin, Endamê MÊRIK, Pîrik û li pey wan jî Qerewêlê duyem dikevin hundir.*)

SEROK: Dem baş.

YÊN DINÊ (*Zêde rêzdar in.*)

- Dem baş!

- Dem baş!

- Fermo!

- Hûn bi xêr hatine.

KALEMÊR (*Qerewêlê duyem. şanî hevsera xwe dide, bi qasî ku yên dinê nebihîsin*): A yê dinê jî ev e!
(*Jinika Pîr ji Kalemêr re, bi îşaretan vedibêje ku wê MÊRIK hêrs bibe.*)

JINIK: Hûn ê li ku derê rûnên.

SEROK (*Hundirê malê di ber çavan re derbas dike.*): Em li ciyekî wiha bilind rûnên. Lewra divêtiya kar ev e.

MÊRIK (*Bi destan şanî dide.*): Ev der baş e.

(*Serok li endamên dinê jî dinêre. Ew jî bi serhejandinê erê dikin.*)

SEROK: Baş e.

(*Serok û endam rûdinên.*)

Qerewêlê 1. û 2. li ser lingan li ber derî sekinîne. Kalemêr bi baldarî li endamên Lijneya Darizandinê û li qerewêlan dinêre.)

SEROK: Sehpayê bînin!

(*MÊRIK û jinik sehpayê li ber Serok datînin.*)

MÊRIK: Hûn tiştêkî dinê dixwazin?

SEROK: Dema ku em bipeyîvin, dibe ku devê me ziwa bibe. Hinek jî avê bîne, ji me re! Bila qedeh jî têra me bikin!

(*Jinik sûrahiyek av û çend qedehên darînî datîne ser sehpayê.*)

SEROK: Tu sax bî qîza min î xanim. Bûk li ku ye?

JINIK: Ma bila bê?

SEROK: Vê gavê! Em demê derbas nekin.

JINIK (*Ji kurê xwe re*): Ez ê bang bikimê.

(*Jinik diçe hundir. Îşaret dide ku Jinika Ciwan were.*)

SEROK: Bêyî bûke ma tiştêk tê axaftin! (*Ji Jinika Pîr re*) Ma ne wisa ye?

JINIKA PÎR: Rast e.

SEROK: Her kes dikare rûnê. Yên ku me ji wan pirs pirsîn bila bînin li vê derê li ser lingan bibersivînin. Hat fêhmkirin?

ÊN DINÊ: Hat fêhmkirin.

-Tu sax bî.

SEROK (*Ji endamên dinê re*): Em dest pê bikin?

(*Ên din bi serhejandinê erê kirin.*)

KALEMÊR (*Bêdeng ji hevsera xwe re*): A soxî wê qerewêlan bidarizînin.

(*Jinika Pîr bi îşaretan vedibêje ku bêdeng be. Mîna pandomîmkarekî hoste bêdeng vedibêje ku wê bûk berî roja xwe zarok bîne.*)

KALEMÊR: Tew jineke bihemle jî! Kujerno!

JINIKA PÎR: Bêdeng be!

SEROK: Beriya ku em bêne vir, me seriyek da raxên avê. Hûn dizanin rax dema ku bi berfa heliyayî tije dibe, xetere diqede. Lê me bi xemgînî dît ku ji bo ku rax tije bibe bi qasî qalindiya du tiliyan valayî heye. *(Bi destê xwe şanî dide)* Ev tê wê wateyê ku îro yan jî herî dereng sibehê wê ew valayî jî bê dagirtin û wê xetere derbas bibe. A wê demê, yên ku serê çelan çûbûn wê bi zar û zêçên xwe, bi arvan û şekir û xwêya xwe, bi sebze û goşt û her cure xwarinên xwe werin û nêzikî sê mehan yanî heta ku berfa pêşîn bikeve wê bi me re bin. Em ê dawetan, zarokanînan, şahî û şadiyan bibînin. Dema ku berfa pêşîn bibare jî hevserên ku zaroyên wan çêbûbin û yên dinê wê vê derê terk bikin û biçin. Heta havîneke dinê, dîsa wê bixebitin û bidin ser hev ji bo ku yên li vîra dimînin zivistanê bi rihetî derbas bikin. Paşê ji nû ve dîsa wê bê. Ji nû ve wê bê. A va ye em di vê rerwşê de ne, demeke berê xanima Pîrikê hat cem me û rewşeke ku nayê payîn ji me re vegot.

(Endamê MÊRIK serî da kuxikê. Her kes qilqilî. Bi hîndariyê Endama Jin bahlîfek dirêjî MÊRIK kir. Endamê MÊRIK devê xwe xist bahlîfê û bêdeng kuxiya. Qirika xwe jî paqij kir. Bahlîf ji nûvde dirêjî Jinê kir.)

SEROK: Bi xemgînî divê ez diyar bikim ku tiştê ku bûye, ev pêncî sal in, nebûye. Rastiya zarokanîna berî roja xwe. Wek endamên dinê ez jî pir xemgînim. Lê tiştê ku em bikin tune ye. Em ê rêbazan pêk bînin! Lewra ev, têkildarî rewşa jiyana mirovên din e.

(Endamê MÊRIK wek ku dîsa wê bikuxe. Êdî bahlîfek jî têrê nake. Yên dinê çend bahlîfan didin ser devê zilêm. Demekê wisa didome, Endamê MÊRIK bêtaqet dimîne, nalive. Miriye. Wî dibin ciyekî bilind. Her kes bi rêzdarî di ber re derbas dibe.)

SEROK: Niha, em zêde demê nebuherin, divêtiya karê xwe bikin. Em vegerin ser karê xwe yê asasî. *(Ji Pîrikê re)* kengî te agahdar kirin?

PÎRIK (Radibe ser lîngan) : Berî bîstikekê.

SEROK: Encam?

PÎRIK: Zûka min hat li bûkê nêrî. Paşê jî min we agahdar kir. Bi xemgînî dibêjim ku wê bûk bizê.

SEROK: Tu amin î.

PÎRIK: Teqez.

SEROK: Tu dikarî ji nûvde lê binêrî.

PÎRIK: Ne lazim e. Lewra îşaret tev rewşê rast derdixin.

SEROK: Tu dikari rûnêyî. Hûn! (*MÊRIKê Ciwan û Jinika Ciwan radibin ser lîngan.*) Me got di şert û mercên asayî de ji bo ku zayîn çêbibin em motacî zemanekî ji mehekê zêde ne. Lê hûn, beriya ku xetere derbas bibe, hûn ketina rewşa zayînê. Hûn dizanin ku ev sûcekî ku jiyana mirovên dinê dixê xetereyê ye, ne wisa?

MÊRIKÊ CIWAN: Em dizanin.

JINIKA CIWAN: Em dizanin.

MÊRIKÊ CIWAN: Lê ma ev ne sûcê me ye ku?

SEROK: Çawa yanî?

MÊRIKÊ CIWAN: Mezinên me hesab kirin. Gotin filan rojê wê bibe û wê rojê em zewicîn. Heta wê şevê ancax hevsera min ji dûr vê şanî min dan. Qet tu wextê ez û wê nehatin cem hev jî.

MÊRIK: Birêz Serok ku destûr hebe, ez dixwazim bipeyîvim.

SEROK: Zêde dirêj nekin û bibêjin.

MÊRIK: Kurê min rast dibêje. Me beriya roja wan qet nehişt ku bîn cem hev. Me tim ew asteng kirin.

JINIK: Me nehişt bi destên hev jî bigirin.

SEROK: Bê destûr nepeyîvin. Hat fêhmkirin?

JINIK: Hat fêhmkirin Serokê min.

SEROK: Em bibêjin her tişt di roja wê de çêbû. Ez fêhm nakim ku ji vê em ê bi ku ve herin.

MÊRIKÊ CIWAN: Zarok beriya dema xwe hatiye. Zarokanîneke bêhemd e.

PÎRIK (Radibe ser lîngan): Herê Serokê min. Ev zarokanîneke bêhemd e.

MÊRIKÊ CIWAN: Yanî sûcdar ne em in.

(Bêdengî)

SEROK: Wisa be ne wisa be çi ferq heye? Em li vê derê nabêjin zû ye yan dereng e. Em li encamê dinihêrin. A niha, yanî hê ku xetere heye hevsera te diwêlîde. Ev me eleqedar dike. Lê ji derveyî rêgezan, berî dema xwe çûyîna nivînan hebe bê şik ev jî me eleqedar dike. Lê ev encamê naguherîne. A niha li vira tiştta ku wê bê kirin aşkere ye. (*Bêdeng erêniya endamên dinê disitîne.*) wê vê Jina Ciwan bi lezgîni bixin tabûtê, paşê jî wê bê binaxkirin! Hûn zanibin ji ber vê biryarê em jî xemgîn in ku ev bila ji we re bibe berbîn.

MÊRIKÊ CIWAN: Serokê min.

SEROK: Êdî tiştêkî ku bê gotin nemaye. Lewra vê jina ciwan li ser hemanan e dê biwelide. Ne hewce ye ku ez bibêjim wê encama vê çi be? Binihêrin ku îtiraza Pîrikê hebe, dibe ku înfaz bê sekinandin. (*Ji Pîrikê re*) Lewra ya ku îtiraza wê hebe tenê tu yî. Fikreke te ya li hemberî vê rewşê heye?

PÎRIK: Na Serokê min.

SEROK: demek beriya demekê bila rêgez bên pêkanîn!

KALEMÊR: Vana qerewêlan nadarizînin!

(MÊRIK û Jinika Pîr îşaret kirin ku Kalemêr bédeng be.)

MÊRIKÊ CIWAN: Hevsera min bi neheqî tê darizandin. Ev rewş ne kêmaniya me ye. Çi ye, rêgez wisa ne! Halbukî me tiştêkî ji derveyî rêgezan jî nekiriye. Daweta me, zewaca me, her tişt di zemanê xwe de pêk hat.

SEROK (*Hêrs dibe*): Em li ser vana axivîn kurê min. Ev cara pêşîn e ku kesek wiha li hemberî me radibe. Gelo hewce ye ku ez bi bîr bixim ku mirovên me yên diçin derveyî welat çima zû kar dibînin? Lewra ew li hemberî tu tiştî dernayên! Rêzdariya xwe ya li vir li her derê nîşan didin. Ger li nav civaka me gotina bêhizûriyê ji holê rabûbe, sedema vê ya rastîn, bibiryarî bicîanîna rêgezan e, em viya ji bîr nekin! (*Hêrs dibe*.) Tu dixwazî çi bibêjî? Em rêgezan guftûgo bikin bila ew qas mirov bimirin!

MÊRIKÊ CIWAN (Zêde hestiyar): Bila ew qas mirov nemirin! Bila hevsera min jî nemire!

SEROK: Ez xemgîniya te fêhm dikim xorto. Me jî xortanî dît. Me jî hez kir. Lê ji bo jiyana mirovên dinê divê tu zanibî fedekariyê bikî.

MÊRIKÊ CIWAN (Hindik maye ku bigirî): Ma hema wisa zû zarok nayê! Ji kere ma xwe hinekî dinê bisekinînin.

SEROK: Tiştêkî wisa ne mimkûn e. Ez gundekî mezin nikarim têxim xetrereyê. Ya hevsera te ya mirovên dinê. Yanî em tev. Rêyeke din tune ye! Çareseriyê ku jiyana her kesî rizgar bike hebe çima ez pêk neynim? (*Bibiryarî*) Zû bi zû divê înfaz bibe. Yanî wê rêgez bêne cî! Ku hevsera te niha zarokê bine ma em dikarin çi bikin? Qîrîneke hevsera te bes e. Ka em ê bi qîrînen pitikê çi bikin? Wê demê wê çiya bi ser me de neyên? (*bi carekê hêrs dibe*) Ger ku axaftina xwe bidomîni ji bo te jî dibe ku em heman biryarê bidin! Êdî bédeng be!

MÊRIKÊ CIWAN: Serokê min.

SEROK: Te hişyar dikim! Ji bîr neke! sikût zêr e! Bi sedsalan e rêgeza me ev e.

(Îşaretê dide qerewêlan ku tevbigerin.)

KALEMÊR: Ev qerewêlan nadarizînin! Di şûna kujeran de wê bêguneh binax bibin!

SEROK: Ev çi dibêje lo!!!?

KALEMÊR: Ên ku birayê min fetisandine bidarizîne kuro!

SEROK: Tu çi dibêji?

KALEMÊR: Kujeran bidarizîne kuro! Ku ji qûna te tê wan bidarizîne! Lê tu nikarî bidarizîni! Lewra ew ê te bifetisînin!

SEROK: Zû devê viya jî girêbidin!

(Qerewêlê yekem bi kincekî mezin ê ku bi xwe re aniye dixwaze devê mêrik girêbide.)

SEROK: Hinekî ecele bikin!

KALEMÊR (Him nahêle ku devê wî girêbidin û him jî): Ez niha birayê xwe hê qenctir fêhm dikim. Ez wî baş fêhm dikim!

SEROK (*Ji qerewêlê yekem re*): A din jî amade bikin!

QEREWÊLÊ 2.: Ferman a te ye!

(*Qerewêlê duyem ji bo ku devê bûkê girêbide tevdigerê.*)

SEROK: Te ez şaşwaz kirim xorto. Lê dîsa jî ji bo êşa te ez te efû dikim.

QEREWÊLÊ 2. (*Devê Jinika Ciwan û herdu destê wê jî ji paşve bi hev girêdaye*): Temam e Serokê min.

SEROK (*Bi destê xwe îşaret dike ku çavên wê jî girêbide*): Karê xwe nîvco nehêle!

(*Qerewêlê 2. çavên wê jî girêdide, bûk ji tirsan diricfe.*)

SEROK: Tamam. (*Ji yê dinê re.*) Wê tu kes ji vira neqete! Heta ku ev kar biqede hûn ê tev li vê malê bimînin. (*Ji qerewêlê 1. re*) Tenê tu yê li vira bimîni. (*Ji endamên dinê re*) De haydê rabin. Em şahidiya xwe bikin. (*Serok û Endam radibin ser lingan. Qerewêlê 2. dema ku dixwaze Jinika Ciwan bibe di zorê de dimîne. Lewra bûk naxwaze bimeşe. Bi nalîni dixwaze çûyina xwe asteng bike. Li ser hişyariya Serok*

Qerewêlê 2. bûkê bi qûnkîşkê, bi kîşkîşandinê tîne ber derî. Li pey wan jî Serok û Endam hêdî hêdî dimeşin. Dema ku yê din bêdeng dimînin MÊRIKÊ Ciwan bêyî ku ew pê bihesin qutî vekiriye û fîşek ajotiye devê tivingekê ji wan.)

MÊRIKÊ CIWAN (*Berê tivingê dide hewayê.*): Bisekinin!

(Her kes disekine. Şaşwaziyeke mezin e rewş.)

SEROK: Tu dixwazî çi bikî kurê min?

MÊRIKÊ CIWAN: Min got bisekinin!

ENDAMA JIN: Ev çi ye? Ev çi dike?

MÊRIKÊ CIWAN: Nekin ku ez tetikê bikişînim!

SEROK: Ma tiştêkî wisa dibe?

ENDAMA JIN: Ma ku tu tetikê bikişîni wê tiving neteqe? Ku tiving biteqe... Wey Xwedêyo!

SEROK: Lê. Lê em ê tev bimirin!

MÊRIKÊ CIWAN: Herê. Em ê bimirin! Ya wê hevsera min bijî yan jî em ê tev bi hev re bicihemin!

(Bêdengî)

MÊRIK: Deyne wê tivingê.

JINIK: Tu dixwazî me jî bikujî?

MÊRIK: Ma em ê tev nemirin?

MÊRIKÊ CIWAN: Yabo, hûn eleqeya xwe jê neynin.

MÊRIK: Em ê çawa neynin? Aqilê xwe bide serê xwe kurê min.

MÊRIKÊ CIWAN: Ma bila hevsera min bimire? Ji bo ku hevsera min û zaroka min î ku wê bibe çi ji destê min bê divê ez bikim!

MÊRIK: Ma tu dikarî çi bikî?

JINIKA PÎR: Em ê tev bi hev re bimirin!

JINIK: Tu hê ciwan î. Ma jin ji te re tune ne? Jêder tu yî. Dibe ku zarok ji jineke dinê jî bibin.

JINIKA PÎR: Tu yê bibî kujerê dê û bavê!

KALEMÊR: Ez bi neviyê xwe şanaz im!

MÊRIKÊ CIWAN: Hûn ji min fêhm nakin! (*Ji Serok ra*) Bila qes nelive! Derbasî ciyê xwe bibin. Min got derbas bin, derbas bin!

(Serok û Endam derbasî ciyê xwe dibin. Qerewêlê 2. ji nûvde bûkê tîne ciyê wê yê berê. Bi îşareta hevserê xwe girêdana dest, dev û çavên xwe vedike. Bêdengî.)

SEROK: Devê min ziwa bû. Ez dikarim avê vexwim?

MÊRIKÊ CIWAN: Vexwe!

(Serok avê vedixwe. Endamên dinê jî vedixwin.)

SEROK: Wê niha çî bibe îcar?

ENDAMA JIN: Em li benda çî ne?

MÊRIKÊ CIWAN (*Ji Qerewêlê yekem re*): Tu! Yabo tu jî. Herin li raxan binihêrin! Rewşa dawîn çî ye em bibînin. Neewirin!

(*MÊRIK û Qerewêlê 1. dertên.*)

KALEMÊR: Em Qerewêlan jî bidarizînin.

(*Jinika Pîr hevserê xwe bêdeng dike. Her kes wisa bendewar e. Nexasim Serok û Endam him ditirsin û him jî pîr şaşwaz in. Piştî demeke dirêj MÊRIK û Qerewêlê 1. tîn.*)

MÊRIK: Tiliyek!

QEREWÊLÊ.: Herê tiliyek.

MÊRIKÊ CIWAN: Jixwe cardin sancu nehatê. Belkî jî Pîrikê pê dernexist! Ev ne sancoya zarokanîne ye. Lê jî ber bêsebrîya we hindik mabû ku hevsera min bimire. Binêrin, hûn dibînin. Ma sancu filan heye li holê?

SEROK: Tu çî dibêjî lawê min? Ma Pîrik derewan dike? De heyda em li aliyekî? Diya te, bavê te. Wê tev bimirin! Dilê te bi wan naşewite?

(Ji nişka ve jinika ciwan jî ber êşê dinale.)

SEROK: Wey Xwedêyo!

PÎRIK: Wê ev jinik biwelide!

MÊRIKÊ CIWAN *(Ji Qerewêlê yekem.re)* Devê wê girêbide!

(Qerewêlê yekem devê bûkê girêdide.)

MÊRIKÊ CIWAN: Bibe hundir.

(Qerewêlê yekem dema ku Jinika Ciwan dibe hundir, Kalemêr bêdeng li çepikan dixwe û kêfxweşîya xwe şanî dide.)

MÊRIKÊ CIWAN *(Ji Pîrikê re)*: Derbas be. Yadê, tu jî bibe alîkar.

PÎRIK *(Ji Jinikê re)*: Leganek ava germ bîne! Zû!

MÊRIKÊ CIWAN: Zû yadê!

SEROK *(Sawê ew girtiye)*: Lê qîrînên pitikê!

ENDAMA JIN *(Bi sawgirtî)*: Qîrîn!

SEROK: Em ê tev bimirin!

ENDAMA JIN: Em ê bimirin!

KALEMÊR: Jixwe ez hatime ku bimirim. Ferq nake. Ez niha birayê xwe qencîr fêhm dikim. Beriya ku bimirim ez jî dixwazim biqîrim. Dixwazim biqîrim! Hema a niha!

JINIKA PÎR: Na! Nebî nebî tu tiştêkî wisa bikî!

MÊRIK: Ez kurê te me yabo!

JINIK: Dawiya emrê me ye lawo.

MÊRIK: Tu yê bibî sedema mirina min jî!

(Bi destên xwe devê bavê xwe digire.)

JINIK *(Ji kurê xwe re)*: Min tu mezin kirî. Ma min ji bo ku tu ji mirina min re bibî navbeynkar min tu mezin kirî? Ez ked û şîrê xwe li te helal nakim.

MÊRIKÊ CIWAN: Bêdeng bin!

(Pîrik îşaretê dide Qerewêlê 1. ku derê derve. Qerewêlê 1. tê cem yên dinê. Qerewêlê 2. bêyî ku ew fêhm bike ber bi MÊRIKÊ Ciwan ve dimeşe. Tam wê milê wî zeft bike MÊRIKÊ Ciwan wî dibîne û bi qundaxa tivingê lê dixê, wî dixê erdê.)

MÊRIKÊ CIWAN: Nebî nebî! Cardin neceribîne!

SEROK *(Ji Qerewêlê 2. re)*: Tiredîn!

MÊRIKÊ CIWAN: Hat fêhmkirin?

QEREWÊLE 2.: Hat fêhmkirin.

(Li hundir, bûk serê wê ber bi temaşevanan de hatiye dirêjkirin.. Zayîn bi bêdengî pêk tê. Ji aliyekî jî Pîrik bi îşaretan ji Jinikê re dibêje tu yê çawa tevbigerî.)

ENDAMA JIN *(Bitirs)*: Lê. Divê devê kitikê jî her tim girtî be. Lewra wê li pey hev biqîre.

SEROK: Heta ku rax tije bibe divê devê kitikê her tim bigirin.

(Nalîn û axînên bûkê zêdebûne. Axîn fetisokî û ji kûrayî tèn. Axînên bûkê ji nedîtve disekinîn. Pîrik devê kitikê digire û wê bilind dike.

Kitik ji destê Pîrikê dişemite leganê. Qîrîn dikeve guhên her kesî, qîrînên dijar.

Qîrînên ku mîna kenê bi hîrehîr in û ku mirov ker dikin li pey hev in. Pîrik car de kitikê zeft dike.

Bêdengeyîke kûr.

Dengvedana qîrînan tê.

Car de bêdengî.

Her kes bi xof li bende gurmîna aşî e. Li aliyekî jî hinik dia dîkin.

Tu îşaretên ku wê aşî bê tuneye.)

SEROK: Nehat!

ENDAMA JIN: Her wiha wê neyê.

MÊRIKÊ CIWAN: Bêdeng bin!

(Demeke dinê bêdengî.)

KALEMÊR *(Tevî astengkirina hevsera xwe jî, tivinga di destê MÊRIKÊ Ciwan de zeft dike, direvîne û dertê derve. Halaneke bêhawe jê tê.): Hêêê!*

(Piştî demekê halana wî deng vedide. Îcar jî tivingekê berdide. Dengvedana wê jî tê. Bendewariya bi qîleqil vedigere şahiyê. Dengê def û zirneyê tevlî dengê tivingan dibe...)

DAWÎ

4 Gelawêj 2001, Sarigerme-Ortaca

